Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(70) Çirriya Pêşîn 2006 z~2618 k Buha (15) p.s

Li Şamê

Pêncê Çiriya yekê 2006-an

Cara yekemîn bû ku, bi vê tevahiyê, serûber hêzên siyasî , civaka şaristanî, mafperest, mirovhez û rewşenbîrên ku , ji desthilatdariya parta Be'is re neberdevik, li pêşî hêzên danezanîna Şamê – Îlan Dîmeşq – li navenda paytexta Sûriyê li roja pênşemê 5-ê Çiriya yekê 2006-an , li pêş û derdora avahiya seroktiya şalyaran xwe tev didin û tevgerê dikin. Da ku karibin, dengê xwe bighînin dewlet û raya gştî, bona çareserkirina pirsa kurdên bênifûs, li parêzgeha Hesekê , ku ev e 44 sal in di ser re dibore.

Bi rastî ev çalakiya he , kir ku , têklî û karê hevpar, di navbera Kurd û Ereban de hê bêtir xurt û geştir bibin. Rê li ber siyaset û xefkên rijîma Be'is a şoven û malxur teng bibe û bête girtin. Ev reng siyaseta ku dixwaze xelkê berde hev û baweriya bi karê hevpar bişkîne, di navbera hêzên civaka Sûrî de sarbûn û dijayetiyan biçîne û geş bike.

Hêjayî gotinê ye ku , parta yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê, weke birekî giring ji tevgera kurd, ji roja pêşî ve , ji berî bêtirî deh salan, biryara xwe dabû ku, berê xelkê xwe bide Şama paytext. Da ku karibe, deng bi pirsa kurd û bênifûsiyê xîne . Di ber vê yekê de, gelek heval û hogir dihatin girtin. Di pê re , li gel Hevbendiya Demokrat û dûv re , Berê Demokrat û li vê dawiyê, hemî partî û rêxistinên kurd digel ên Ereb û Sûrî, yên ku li beramber rijîma Be'is dibêjin na. Tev ketin wê baweriyê ku, bona çareserkirina pirsa bênifûsiyê, pêwîste xebat û çalakî, bi her hawî, nemaze bi şêweya kombûnên cemawerî li Şamê, di lêhatina salvegera bîranîna vê pirsê de bêne kirin.

Baş xuya ye ku, ew sozên karbidestan , bona çareserkirina vê pirsgirêkê, yên ku gelek caran dubare dibûn, dimane sozên xapînok û dibûne kenpêkirin.

Sînorê Yekta